

## Roja cîhanî ya zimanê dê

Selah Beyro

*Li* gel destpêka guhartinên siyasî yê dijwar ku, li welatên erebî têne rûdan û rijêmên wanî regezperist têne têkdan û ruxandin, nemaze li wê dema ku em pêşwaziya hilkefta roja cejna cîhanî ya zimanê dê dikin ya ji bal kongirê rêxstina Al yûnsko giştî ve li rêkeftî 17.11.1999. ê hatî li darxistin, ragehandibû ku ji sala 2000.z pêde her sal /21/sibatê Mîna cejna zimanê dê li cîhanê tê destnîşan kirin û pejrandin, ew jî ji bo besendkirina çandên heme cor ,û pir zimanî li cîhanê ,ev zimanê ku bihtir ji /7000/ netew û kêmandam li ser vê xakê pê di peyivin, û li gor agahiyên zanyarên ziman wê ev rêje ya zimanan kêmtir bibe ji encamê teknolociya serdem ,bi hatina nîfşên nuh re li paşerojê. Li vê serdemê pir guhertinên lazgîn li ser hemî astan hatine rûdan û bikaranîn bi binesaziya rêzgirtina hemecora ziman zanî û çandeyî û hevçerxî û siyasî, li welatên dîmukrasî û hevçerx yek reng û yek çand û yek boçûn nayê pejrandin li vî çerxî û tu paşeroj jêre nîne li dema diyar kirî de, lê mixabin rijêmên kurdistan dagirkirin mefa ji van guhertinên lazgîn ta nuha ne wergirin, û baweriya wan bi netewên heme cor nayê, û ev rijêm ji yek reng û yek çand û yek derbirîne pê ve na pejirîne, lew ra bi dihan ziman zan û helbestvan û nivîskarên kurdistanî ji bal wan ve têne girtin û bin Çav kirin. Banga min ji gelê kurd re ku gotina Mîr Celadet Bedir Xan li bîra xwe bînin ya li sala 1941ê di hijmara /27/ê hewarêde gotibû: " Malxerabo ! ma we ew çend wext nîne hon ko ji bo hînbûna zimanên biyaniyan bi salan ve xebitîne îro jî dixebitin ji bona ko bikarin "fînfoneke" derewîn bi lêv bikin

Kuro .. Keçê

Eybe..şerme..fehite, an hînî zimanê xwe

bibin an mebejin em Kurd in bê ziman Kurdîtî ji we re ne tu rûmete ji me re rûşîk giran e Heyf û xebînet û hezar mixabin nemaze ji wan re ko bi zimanên din dizanin bixwînin û binivîsînin û elfabeya zimanê xwe hêj nas nakin " Bêgoman pir partiyên siyasî û kurdperwer di van kawdanên aloz da aloz da nîfşê nuh fêrî zimanê zik makî(dê)dikin, ew jî cihê rêzgirtinê ne, pêwîste ev roj bibe helkeftek ku hemî gelê kurd bizmanê xwe yê zikmakî şêrîn bixwîne û bi xwendin bide. Bijî roja cejna zimanê cîhanî.

*Ji malpera Welatê me*

\*\*\*\*\*

### Ednan dilbirîn

A. Tislorî

Hunermendê ciwan, Ednan dilbirîn, li gundê Dêrsiwane – herêma Efrînê ji dayîk bû. Ew di sal 1957 an de, evînerweriyeke xurt , deng xweş , zelal û nefes dirêj bû. Wî pir bi coş stiranên xwe pêşkêşî cemawer dikirin . Di sala 1980 ê de, çû bajarê Helebê û dest bi huneriyê kir , û pir gotin û awazên sitranên xwe bi xwe çêkirin .Ednanê Mûsê "7" kasê belav kirin û ciyên pesnê bûn ,wek Sewda û Efrîn .Pênc zarok wî du xort û sê keç çêbûn . Dilbirîn, navê wî yê hunerî ye .Ew çû Almaniya û li wir 2 aheng çêkirin û ciyê kêfxweşiya gelê Kurd li wir bû . Pir caran li cejna Newrozê , wî stiran gotin . Stirana wî ya bi nav û deng Gula nîsrîne bû. Herweha li pir ahengên sersalê distira û dilê guhdaran xweş dikir . Kasêta wî ya dawiyê bi navê Înanke bû .

Qedera wî hunermendî ciwan, ku li ser riya gundê Kefercenê û Helebê bi qeza otombîlê here ser dilovaniya Xwedê . Temenê wî "42" sal bûn .

Gava termê wî rakirine , gelê Kurd pir vêre bi rê ketin û li nav bajarokê Efrînê gerandin û li pêşiya havîngeha ( Elselam ) hunermendê mezin Elî Tico gotinek bi eş li ser wî got. Ednan dilbirîn kurdekî pak bû ,ciyê rêz û hurmetiyê bû , welat hez bû û hunermendekî ciwan bû, lê ,mixabin qedera wî wilo bû. Bila ciyê wî buhûşt be .